Ji kî dera tenêtiyê ve tê girtin?

Omer Dilsoz

…min dilê xwe ji te re vekir; min got, ‘Tu heyî û neyiya min î’

Çi gava ku tu dihatî nik min, ez pê dihesiyam ku derdekî te heye. Jixwe ku tu derdê te nebûya tu nedihatî. Ez bûbûm dergehê derdên te; te kulên xwe li nik min ditewandin. Kovanên xwe te li ser kezeba min dipatin. Ez sêla xem û janên te bûm. Ez çopdank û kulîfeka hêrs û kerba te bûm; te hemû kîn û rika dilê xwe bi ser hişê min de dirijand. Gava ku xemek li te peyda dibû ez dihatim bîra te; tenê te ez babet û layiqî kulan didîtim; an xune, te ez wekî xwelîdanka janên xwe didîtim. Lê hezkirin? Her ji çi be, hezkirina min li ber çavên te tenê wekî çivêliyê, wekî pûçatiyê, wekî hestên zaroktiyê bû; te tu pûke pê nedida.

Çi gava ku tu dihatî nik min, ez pê dihesiyam ku awirên te avisê êşekê ne. Min dizanî ku teyê

barê kulên xwe bavêta nav dilê min. Careke dîtir te dê bi kulan dilê min werimandiba û tuyê piştre ber bi hezkiriyê xwe ve biçûya. Ji ber ku evîna te ji bo wî bû, lê ji bo min tenê jan hebûn. Tenê ez çivêlê xemrevînk bûm, bi gotinên min te yê xemên xwe birevandina; te yê ji kîsikê dilê min peyvên min verotina û bibirina, ew raberî hezkiriyê xwe bikirana. We yê bi diziya evînê 'evîneke heram' ava bikira û hûnê bi wê evîna heram bijiyana.

Kengî tu dihatî nik min, ez pê dihesiyam ku evîn û têkiliya te tûşî aloziyekê bûye. Te yê ji min, ji çivêlê evînê, ji palê pûşî, ji dilşikestiyê evînlêdizî alikarî bixwesta. Ligel ku derew bû jî, tuyê wekî dostekê, wekî dilsozekê tevbigeriyayî û minê jî ji te bawer bikira… Ez çi xeşîm bûm, ne wisa? Minê jî xwe bi awirên te wer kira û wisa bawer bikira heçko tu bi min re rast î. Heçko tu dildar î. Heçko tu dost î… Te dê ji dilpakiya min sûd wergirta û te dê bi wê jî, hemû dilqenciya min pêpes bikira. Dê hêviyên min ên birîndar di bin pêpeskirina bêbextî û durûtiya te de bigeviziya. Wekî daralînkekê tenê dê 'destê tenêtiyê' li ber jiyana min a li serê kendal û rijdeya jiyanê rawestiyayî, vekirî mabûya. Li serê kendalî û bi tena serê xwe… Ma minê bi kî dera tenêtiyê ve bigirta! Ew, wekî agir bû; ku te destê xwe bidayê dişewitand.

Çi dema tu dihatî nik min, ez pê dihesiyam ku dê êşeke dîtir li ser êşdanka min venişta. Tu bayê êşan bûyî û bêndera êşên te jî ez bûm. Tu dihatî, te li ser coxîna dilê min êşên xwe didan bayê. Piştre bi asûdehiya xwe ve ber bi evîndarê xwe ve diçûyî. Lê êşên te li ser dilê min diniştin. Mixabin sîbera evîna te jî nedigihîşt min… Hingê tenêtiya har hemû ruh û bedenê min dipêça. Wê demê li ferhenga min peyv û têgîn diguherîn; hatibû gotin ku 'dostanî di demên tengav de diyar dibe' lê min ew têgih li hişê xwe guhartibû. Li gorî min, 'Dostanî bi parvekirina xweseriyan diyar dibû.' Mirovî devê kîsikê xweseriyên xwe li ber kê vekiribe, di dem û heyamên xweser de bîra mirovî hatibe kê, bi rastîn mirovî ji wî/wê hez dikir.

Kengî tu dihatî nik min, ez pê dihesiyam ku dê êşeke dîtir a min a tûgirtî careke dîtir jan vedaya. Ez êdî bûbûm janxuriyê janan. Li nava pêlên janan wer bûbûm. Hest û ramanên min serê xwe dixwar. Serê hev dixwar. Ji hev dixwar… Ez di lepê te de dişibiyam dûpişkekî bêgavmayî. Hindik mabû ku minê xwe bikuşta. Minê serê xwe bixwara. Tengavî… Tengaviya ji bêgaviyê; te wekî daralînkê xwe bi hemû reh û rîşên laşê min wer kiribû. Her ku diçû ez pûç dibûm. Êdî min hew dikarî êşên te ragirtina jixwe yên min ji min zêdetir bûn. Hingê min lanet li wê roja ku min tu naskirî kir û wekî kesekî nemelevan xwe berî pêlên tenêtiyê da. Ma minê dilê xwe li kîjan lîsê tenêtiyê vedaba, tev kendal bû; şikêr û lat bû. Bi avêtina gava yekem ezê gêr bibûma…

Kengî tu dihatî nik min, ez pê dihesiyam ku ezê careke dîtir di nava demên bêdemiyê de gêr bûma û li evrazê jiyanê gindirî bûma. Her ku min li nav reşika çavên te yên bawerkuj dinêrî, dilê min heçko dûpişk pê vede hildiperî û wekî tayê tûhêkê (duhokê) direcifî. Canhêliya min a li ber bayên xelekên dem û heyamên bêwext ketî, li ser reşika çavên te dişewitî. Min xwe li ber pêlên kenê te yê derewîn nedigirt û ez di nava bêdemiya paletiya êşên evîna xelkî de, serobin dibûm.

Ax umrê minê, ax tenêtî… Minê bi kîjan dilî tu vegirtiya; her ku min li te dinêrî min xwe berze dikir. Ez li ber şerma dilketina evîneke dîtir diheliyam û wekî palê pûşî kerbên min ji min vedibûn û min lanet li xwe; na na, li roja ku ez li rastî te hatime dikir.

Çi gava tu dihatî nik min, ez pê dihesiyam ku şeveke dîtir jî ezê bêxew mabûma. Tu êdî tenê bûbûyî sedema xemê, sedema kulê, sedema janê û egera bêaramiyê. Ez herçend ji te direviyam jî, min nedikarî xwe ji davên te rizgar bikira. Ku tu dihatî, êdî peyv li ser zimanê min bigirê dihatin. Kenê min diqerisî û hêz û şiyan di lingên min de nedima. Piyên min sist, serê min nixwîn û pariyên kulên tal min bi kefezikî dadiqurtandin. Te dîsa dest pê dikir: Ji zimanê te gazin dibarîn. Hêrs û kerba xwe te bi ser hestên min de vedireşand. Te ez bi jehrê didam. Lê min wê demê xwe wekî ku ketibim pîstê berazî radibihîst. Heçko tûvilekî genî û mirarbûyî yê lewitî bi rûyê min hatiye pêçan, ez wisa ji xwe bêzar dibûm. Her wekî gûzeke kurmxwarî, ku kurm bêyî ku haya riskê û di nava riskê de qebûşkê, di nava qebûşkê de tûvilî jê hebe, wisa ji navê ve, ji kakila dilê xwe ve ez dihatim birîndarkirin. Lewma çi gava min tu didîtî, kakila dilê min bi kurmê evîna te ya rijî, evîna te ya ku tenê para min jê êşên wê bûn, dihat daxkirin.

Wexta ku tu dihatî nik min, ez pê dihesiyam ku dê hilma min li ser devê min biqerisiya. Ez pê dihesiyam ku minê kuleke dîtir li çala dilê xwe ya êşan çal bikira. Te tenê bêyomî, êş, kul û janên xwe bi ser tenêtiya min a ku birçîtiyê evîneke germ bû de dirêjand. Çi bû navê vê girêka kor? Hingê ger dostanî bûya divê di tama dostaniyê de, ger evîndarî bûya divê di tama evîndariyê de, ger xweserî bûya divê di tama wê de bûya; lê mixabin, te ne yek ji wan dipejirand, ne jî lê veder dimayî. Hestên min ên ji bo min gelekî girîng û hêja bûn, ên ku li ser kela dilê min dihatin pê, li pêş çavên te tenê çivêliyên zarokane bûn. Ji bo te îdeal û evîn sedemên hebûna hev bûn; lewma jî tu li aşopa îdealên xwe li evîndariyê digeriyayî. Te evîn dipîva. Rajena evîna te geşedana îdeala te bû, lê evîn li nik min tenê di tama evînê de bû û wekî evîniyê jî masûm û bêguneh bû. Te ev aliyê min baş dizanî û te hewl dida ku evîn û îdealê di nava hev de hevîr bikî û bi wê jî, ji xwe û evîndarê xwe re –ku ew kes jî ne ez bûm- cîhaneke ji 'evîna heram' ava bikî.

Çi gava ku tu dihatî nik min, pirsekê hişê min vedigirt, "Ji kî dera tenêtiyê ve tê girtin?" Ji ber ku tu 'tenêtiya min bûyî' heçko tu pê dihesî ku tiştek heye, nêzî te heye lê ne mimkûn e ku tu bigihiyê. Te her gavê ev hest li min nû dikir; piştre jî, te hestên min ên xwerû û sava didotin û ji evîndarê xwe re dibir. Ez wekî gazingeha te lê hatibûm; lê tu bûbûyî êşa min a giran. Tu bûbûyî çala bêbinî ya tenêtiya min. Ma mirov dikare ji kî dera tenêtiyê ve bigire!... Ew, wekî bizot e, wekî gerasîska pêlên har ên çemekî ye, wekî babelîska bagerekî serxweş û har e, wekî serxuriya daralînkê ye; dipêçe, diguvêşe, xwe lê dialîne, dişidîne, dadiqurtîne û wekî kêvroşka ketiye kemîna gurekî har, bêhawar û bêhêvî ye. Ka bêje, ma ji kî dera bêhêvitiyê ve tê girtin?

Ma 'çavkuliya piştî mirinê' bi kêrî çi tê!…